

---

ADNAN ÇELİK

---

# KURD, KAFKASYA Û KURDOLOJÎ: HEVPEYVÎN BI METÎN YÛKSEL RE

---




## Metin Yüksel

Doktoraya xwe di sala 2011an de li Zanîngeha Chicagoyê qedandîye. Ji qedandina doktorayê heta niha, li Zanîngeha Hacettepeyê, di Beşa Zanista Sîyaset û Rêvebirina Giştî de dersên dîroka cihanê, dîroka rojhilata navîn a nû, kolonyalîzm/postkolonyalîzm û rêbaz di zanistên civatî de dibêje. Di kovarên akademîk ên wekî *Middle Eastern Studies*, *The Muslim World*, *Iranian Studies*, *International Journal of Turkish Studies*, *Derwaze*, *Journal of Postcolonial Writing*, *British Journal of Middle Eastern Studies* û *Patterns of Prejudice* de gotar û rexneyên pirtûkan çap kir. Çend sal e berê xwe daye keşfîkirina çavkanîyên farisî di warê dîroka Îranê a sedsala 20an de.

### Adnan Çelik: Ji bo destpêkê dixwazim ji cenabê te bipirsim gelo eleqeya te ya di derbarê kurdên Kafkasyayê de çawa dest pê kir û gihişte çi merheleyê?

**Metin Yüksel:** Min sersala 2004an de li Zanîngeha Chicagoyê di beşa Ziman û Şaristanên Rojhilata Nêzîk (*Near Eastern Languages and Civilizations*) de dest bi xwendina doktorayê kir. Teza min li ser dîroka zimanê kurdîya kurmançî bû. Dema dîrokî ya ku ez ketim pey, ji sala 1925an heta dawîya salên 1950yan bû. Ji ber ku Êrîvan jî wan deman ji bo pêşdeçûna zimanê kurmançî navendek bû, ez mecbûr bûm ku çavkanîyên ji wê derê ji analiz bikim. Ji bo lêkolîna tezê ez nêzîkî neh mehan li Parîsê mam û min bi piranî di kitêbxaneyê Enstîtuya Kurdî de lêkolîn kirin.

Min ji pirtûkên rehmetî Mehmed Uzun navê rojnameya *Rya Teze* seh kiribû. Di kitêbxaneyê Enstîtuyê de min yekem car teqrîben 25 hejmarên *Rya Teze* dîtin. Ev hejmar jî ji arşîva Pierre Rondot bûn. Eger ez şaş nebim, hinek pirtûkên kurdî jî li wir hebûn, ku di salên 1930yan de li Êrîvanê çap bûbûn. Çavkanîyên derheqê kurd û kurdolojîya Sovyetê de ewqas ber destê min tune bûn. Ji ber ku lêkolîneke wekî teza doktorayê bê analîza çavkanîyên destê yekem nayê qebûlîkirin, ez mecbûr bûm bikevim nav çavkanîyên kurdî yên wan deman. Bi rastî, hesreta min bû ez wan bi dest bixim û bixwînim. Mamoste Hamit Bozarslan



jî di nav jurîya teza min de bû û rêyên pir baş dan ber min. Ji min re got divê ez teqez biçim Vîyenayê û di kitêbxaneya Celîlê Celîl de lêkolînê bikim. Dema ez li Parîsê bûm, ez du caran çûm cem mamoste Celîl. Di kitêbxaneya mamoste de hemû hejmarên *Rya Teze* bi awayekî rêkûpêk berdest bûn. Min hejmarên di navbera salên 1930 û 1934an de xwendin. Herweha min bi Celîlê Celîl û xwîşka wî Cemîla Celîl re hevpeyvîneke nêzikî 9 saetan çêkir. Mamoste derbarê kurdên Sovyetê de agahiyên gelek girîng û kêrhatî dan min. Mixabin ji ber ku min zimanên ermenî û rûsî nizanibû, min tenê dikaribû ji çavkanîyên kurmançî sûd wergirta. Piştî ku doktoraya min dawîya sala 2010an qedîya, min derfet nedît li ser kurdên Kafkasyayê lêkolîn bikim. Ji sala 2011an heta niha, min hêdî hêdî berê xwe de çavkanîyên farisî û soranî.

**A.Ç: Di teza xwe ya doktorayê de, tu sê qadan wekî parastina kurmançiyê dibînî: dengbêj, mele û rewşenbîrên kurd. Di qada sêyem de ji xeynî malbata Bedirxaniyan û derdora Hawarê tu bal dikşîni li ser kurdên Kafkasyayê û li şexsiyetên wekî Casimê Celîl, Qanatê Kurdo, Heciyê Cindî û Emînê Evdal dinêrî, ku ew jî wekî “nifşa sêwîyan” hatine binavkirin. Gelo li gor encamên xebata te, em dikarin kurdên Kafkasyayê çawa bi cih bikin di dîroknûsî û çanda kurdan de?**

**M.Y:** Berî ku ez pîrsa cenabê te bibersivînim, dixwazim li ser mijareke girîng rawestim ku dema min teza xwe dinivîsî li ber çavê min nebû lê niha bi min gelek girîng e. Mixabin kurdên ku di dibistan û zanîngehên tirkî de perwerde bûne —ez jî tê de— gelek di bin bandora tirkîtiyê de mane. Perwerdeya li Tirkîyeyê zimanê kurdan mixabin kirîye tirkî. Helbet ev problem tenê di nav kurdan de nayê dîtîn. Rewşenbîrên osmanîyan ên tirkî jî (dawîya împeratoriye de), farsî jî, erebî jî, afrîkayî, çînî û hindî jî bi pîrsa “em kî ne?” mijûl bûne. Ji ber ku nêzikî 200 salan e ku hemû dinya di bin desthilatdariya modernîteya afro-amerîkî de ye, rewşenbîr li her deverê dinyayê bi van pîrsan re mijûl bûne û hîn jî mijûl dibin. Heta îro! Helbet her yek bi awayekî taybetiyên tecribeyên welatên xwe: Homî Bhabha di çarçoveya Hindistanê de behsa “hybridity”yê dike, Ngũgĩ wa Thiong’o ji Kenyayê qala “decolonizing the mind” dike û hwd. Îro jî ber kurdên ku li her deverê Tirkîyeyê hem jî aliyê coxrafî hem jî aliyê nasnameyî ve belawela bûne, di bin bandor û desthilatdariya rojavayî û tirkî de ne. Em êdî nikarin çerxa dîrokê bibin serî, wekî ku tu tiştêk nebûbe. Lêbelê ji bo ku em baştir û bi awayekî saxlemtir li xwe, dinya û dîrokê mêze bikin, divê dîtineke ne-essentialist hebe li me. Wekî Arîf Dirlik dibêje, modernîte “tişt”ek nîne, “têkilî”yek e.<sup>1</sup> Divê kurd jî van rexneyan baş haydar bibin û çî ke-

1 Arîf Dirlik, “Global Modernity?: Modernity in an Age of Global Capitalism,” *European Journal of Social Theory* 6: 3 (2003), r. 279.

malîst çî îslamîst çî femînîst û çî jî nasyonalist, benîştê ku tirkên cût, necûn. Kurd eger li ser tecribeya xwe ya taybetî bifikirin, serê xwe hinek biêşînîn û hewl bidin vê tecribeyê bi dinyayê bidin zanîn, ez dibêjim qey wê hem jî bo xwenasîna kurdan hem jî jî bo analîza civat, çand, sîyaseta îroyîn a hemû dinyayê kêrhatîtir bibe. Ez mînakekê bidim: salên 1930yî li Parîsê tevgerê edebî ya zencîyan bi serektîya Aimé Césaire û Léopold Senghor çêdibe ku bi navê tevgera *négritude* bi nav dikan. Ji ber ku li rojava û li koloniyên Fransayê reşik wekî însan nehatin dîtin, ev her du şairên reşik –ku jî Martinique û Senegalê bûn– hewl dan vê yekê binirxînîn bêjin em însan in, çanda me heye û hwd. Salên 1960ê gotineke şair û dramaturjê ji Nijeryayê Wole Soyinka –yekemîn Afrîkî ye ku Xelata Edebîyatê ya Nobelê di sala 1986an de wergirtiye– meşhûr e: dibêje ne hewce ye piling (*tigre*) pilingîya xwe bide zanîn. (Bi fransî û îngilîzî peyvên “*négritude*” û “*tigritude*”ê baş li hev tên.) Parastina DDKOyê sala 1973yan jî dixwest îspat bike ku kurd û kurdî hene,<sup>2</sup> ji ber ku navê kurdan bûye ‘tirkên çîyayî’. Bêşik, ez jî bo piçûkkirina tevgerên *négritude* û parastina DDKOyê weha nabêjim. Lêbelê wan dema weha bû. Niha êdî wext, dinya gelek hatîye guhestin. Divê analîz û lêkolînên kurdî li gor îmkanên îroyîn tevbigerin.

Ez çima van dibêjim? Bedirxanî, Hawar û “nîfşê sêwîyan” divê di nav vê çarçoveya *dîrokî-dinyayî* (world-historical) de bê bicihkirin. Modernîzasyona kurdan jî, mele û rewşenbîrên wan jî bi awayekî cuda û îzolebûyî ne li xwe ne li dinyayê nenêrîne. Di nav wan têkilîyan de xwe bi cih kirine. Li gor demê ew bi xwe jî hatine guhestin. Hîn di sala 1916an de, Kamuran Bedirxan di helbesteke xwe de dibêje: “Destê dîrokan ê mezin, vê şerefê binivîsin/Serkeftina tirk a bêdawî, hesûdî nekin, bîjmêrin” (*Tarihlerin büyük eli bu şerefi yazınız/Türkün bitmez zaferini kıskanmayıp sayınız*).<sup>3</sup>

Xebatên kurdên Kafkasyayê koka xwe ji tradîsyona oryantâlîzma rûsî digire. Ji ber ku di sedsala 19an de Împeratorîya Rûsyayê sîyaseteke emperyalîst didomand, dixwest ku millet, civat û ferhengên di nav sînorên xwe de binase. Wekî Celîl di xebatên xwe de nîşan dide, kurdzanîya rûsî hema bi bolşevîkan ve dest pê nekir. Kurdzanî, wekî tirkzanî û îranzanî li welatê Rûsyayê gelek pêşketî bû. Tradîsyona kurdolojîya li Rûsyayê diçe digihîje xebatên rewşenbîrekî ermenî: Xaçatur Abovyan, ku bîngeha zimanê modern ê ermenî, ango *aşxarabar* danîye. Li derdora salên 1840î du profesorên bi navê Berezin û Dittel ji

2 Bahoz, *Sen Faşist Savcı İyî Dinle! Dünyada Kürt Vardır: DDKO'nun Savunması*, Uppsala, 1973.

3 Kamuran Bedirxan, “Hilâfetin Rehakârlarına,” di nav: Metin Yüksel (amadekirin û tîpguhezî), *Bobi'nin Hatası: İlk Eserler: Tanin-i Harb, Osmanlı Tayyâreciliği, Bobi'nin Hatası*, Avesta, İstanbul, 2011, r. 21.

Zanîngeha Qazanê bala xwe dane ser civata kurdan.<sup>4</sup> Ne tenê rewşenbîr û akademîsyenên li Rûsyayê, herweha balyozên rûs jî di avakirina xebatên li ser kurdan de cihekî pir girîng digirin. Di sedsala 19an de şexsiyete herî navdar Alexander Jaba ye ku folklorê kurdî û destnivîsên kurdî berhev kirîye. Herweha wî jî bo Mele Mehmûdê Bazidî pêşniyaz kirîye ku ji dema Şeref Xan heta roja xwe dîroka kurd û Kurdistanê binivîse. Di dawîya Împeratorîya Rûsyayê de oryantalistên wekî Marr, Nikitine, Minorsky û Orbeli jî divê bên bibîrxistin. Yosif Abgaroviç Orbeli (1887-1961) yekem car kurdî wekî dersekê li zanîngehê li Petersburgê di sala 1916an de hîn dike.<sup>5</sup> Celîlê Celîl dibêje ku Orbeli pişt bû jî bo xwendekarên kurd û kurdolojîyê û bi nav û zanistîya xwe pir mezin bû, “wekî çîya bû!”<sup>6</sup> Saleke din a girîng sala 1934an e, ku konferansa kurdolojîyê li Êrîvanê tê lidarxistin.

Em vegerin ser pîrsa cenabê te: yek, ez bawer dikim yek jî girîngtirîn karakterîstîkên kurdên Kafkasyayê ew e ku ji sedsala 19an heta îro li ser sînoren împeratorî û dewletên hem misilman hem nemisilman bûne. Herçend cînarên ermenî û siryanî yên kurdên Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrî hebûn jî, ferheng û zimanên desthilatdar îslam û erebî û farisî bû. Bi gotineke din, danûstandin û têkilîyên kurdên Kafkasyayê di sedsala 19an de tenê bi împeratorîyên Osmanî û Qacar û di bin bandora îslamê û zimanên erebî û farisîyê de nebûye; Împeratorîya Rûsyayê jî li ber çavê wan bûye.<sup>7</sup> Ji ber ku bala min zaftir li ser dîroka zimên bû, dema min lêkolîna xwe çêdikir, bi min pir balkêş bû ku hem kurmançî hem rûsî hem azerî hem ermenî dizanibûn. Ev hemû danûstandin jî dihêle ku kurdîtîya wan jî ya her çar parçeyên din cudatir be.

Noqteya duyem jî ku bîr û dîroka kurdên Kafkasyayê karakterîze dike “rojên reş” in ku salên 1918-1920an jî ber leşkerên Osmanî revîne. Ev yek jî helbet nabe ku ji êzidîtîya wan cuda bê dîtin. Em jî bîranînên çapkîrî jî dizanin ku gelek jî wan jî Qersê direvin diçin. Herçend di tradîsyona kurdolojîya Sovyetê de li ser kurdên Kafkasyayê gelek xebat hebin jî, wekî hin lêkolîner jî dibêjin, xebatên akademîk ên li ser dîroka kurdan a sedsala bîstan bi piranî derbarê kurdên Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê dise-

4 Metin Yüksel, *Kolana Weşengîra, Xanîyê 3, Apartamênta Hijmara 6, Êrîvan:*

*Kurdolojî û Malbata Celîlan: Hevpeyvîn bi Celîlê Celîl û Cemîla Celîl ra, Avesta, İstanbul, 2014, r. 20.*

5 Sacha Alsancakli, “The Early History of *Kurdish Studies* (1787–1901),” *Die Welt Des Islams*, 56 (2016), r. 56.

6 Metin Yüksel, *H.b.*, r. 31.

7 Ergin Öpengin nameyeke pir balkêş a Mele Seîdê Şemînanî çap kir ku di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de jî bo tifaqa kurdan a bi rûsan re belav kirîye. Mele Seîd gazî dike û dibêje kurd divê bi rûsan re tifaqê bikin: Ergin Öpengin, “Molla Said Şemînanî” den I. Dünya Savaşı Esnasında Kürtlere Alternatif Bir İttifak Önerisi,” *Kürt Tarihi*, 26 (Eylül-Ekim 2016), rr. 4-9.



kinin.<sup>8</sup> Dema em behsa kurdên Sovyetê dikin, belkî tiştê ku ewila ewil tê bîra me Radyoya Êrîvanê ye ku di 1955an de dest bi pexşê kirîye. Lê dema meriv hinekî vedikole, dibîne ku salên 1920î şûn de bi sîyaseta bolşevîk a ku *sîyaseta neteweyên piçûk* (small nationalities policy) hatibû binavkirin, koka xwe digire û bi taybetî dehsala 1930yan bi pirtûk, perwerdeya bi zimanê kurmançiya kurdî û bi berhevkirina folklorê pêş dikeve. Yanî bawer dikim meriv dikare bibêje ku cara yekem salên 1930yî ye ku bi zêdebûn û pêşketina xwendin û nivîsînê, nifşekî nû ya kurdî li ser ziman û çanda xwe dest bi lêkolînê dike.

**A.Ç: Di xebata te de malbata Celîlan rolekî girîng dilîze. Ji kerema xwe tu dikarî hinekî behsa vê malbatê û rola wan a di dîroka kurdên Kafkasyayê de bikî?**

**M.Y:** Belê. Wekî min got, Celîlê Celîl di pêkanîna lêkolîna teza min de gelek ked da. Ji bo lêkolîna teze ez du caran çûm Vîyena, Eîchgrabenê û min di kitêbxaneya malbata Celîlan de lêkolîn kirin. Bi rastî, ev der ne tenê kitêbxane ye herweha enstîtu û weşanxane ye jî.<sup>9</sup> Min bo lêkolîna teza xwe ji du sazîyên kurd ên li Ewropayê gelek sîud wergirt: Yek Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, ya din jî Enstîtuya Kurdolojîyê ya Malbata Celîlan li Eichgrabenê. Celîl hem kitêbên kurdî yê dersên dibistanên gundên Êrîvanê nîşanî min da, hem jî hejmarên *Rya Teze*. Lê nasîna min a bi malbatê re zaftir bi saya hevpeyvînê pêk hat ku min bi wan re çêkir. Casimê Celîl jî, xanima wî Xanima Celîl jî sêwî bûne. Casimê Celîl ji sala 1930yan û pê de bi awayekî pir aktîf di nav karên weşan, perwerde û wergera kurdî de cih digire. Di sala 1955an de jî di radyoya kurdî de cih digire. Zarên Casim û Xanim çar in: Ordîxan, Celîl, Cemîla û Zînê. Her çar zar jî dixwînin û di warê folklor, dîrok, mûzîk û wergerê de xizmeteke mezin dikin ji bo kurdolojîyê.

Li Tirkîyeyê weşanxaneyên kurdî —şaş nebim— ji salên 1990an ve dest pê kirin xebatên Celîlan wergerandin li ser tirkî. Lê dema min li Chicagoyê doktora dixwend, min gelek kitêbên wan li wir bi dest xist. Me berê behsa oryantâlîzma rûsan kir, lêbelê şayanê gotinê ye ku îro navenda oryantâlîzmê, xebatên pir baş, kûr û dîr ên ne tenê ji Rojhilata Navîn lêbelê yê ji her deverên dinyayê Amerîka ye. Kitêbxaneyên zanîngehên Amerîkî zaf dewlemed in. Hevalekî min ku ji Îranê kitêbên farisî difrote kitêbxaneyên zanîngehên Amerîkî, digot ku kitêbxaneya Zanîngeha Harvardê li dinyayê çî kitêbê farisî çap bibe, dikire! Li Afrîkaya Başûr jî kitêbeke farisî çap be, dikire! Dema min navên Celîlan

8 Harun Yılmaz, “The Rise of Red Kurdistan,” *Iranian Studies* 47: 5 (2014), r. 799.

9 Min nasîna xwe bi Celîl û Enstîtuya wî re, di vê gotarê de pêşkêş kir: Metin Yüksel, “A Transnational Encounter in *Kurdish Studies*: the Casme Calil Kurdish Library in Vienna,” in Ferdinand Hennerbichler et al. (eds.) *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien*, Wiener Verlag für Sozialforschung, Austria, 2015, rr. 296-312.

di kataloga kitêbxaneyaya Chicagoyê de dinivîsî, gelek kitêbên wan derdiketin pêş. Ji alîyekî din ve, min timî serpêhatîyên şexsî hez dikir. Yanî mesela ev kes/malbat kî ye? Çima weha pirtûk/lêkolîn çêkirine û hwd. Bi vî awayî, min xebatek li ser jîyana Mehmed Emin Bozarslan jî wekî gotareke akademîk di sala 2009an de çap kir.<sup>10</sup> Niha wextê bala xwe didim li van xebatên ku min li ser jîyana rewşenbîr û lêkolînerên kurd kirîye ez bi pêjneke şexsî dihesim: bawer dikim ez di literatûra akademîk a bi zimanê îngilîzî de ji nexuyabûna kedkarên kurd aciz bûm. Min dixwest û ez hê jî dixwazim kedkarên ku bi salan ked dane civat, dîrok û çanda kurdan jî bîn nasîn. Wisa xuya dike ku dema lêkolînerêkî rojavayî xebatekê li ser kurdan dike, ew di çavên gelekîyan de biqîmettir e. Min çendek berê kitêbek li ser dîroka dehsalên pêşîn ên Komara Tirkîyeyê xwend. Dema qala “meseleya kurd” dike, wekî referans tenê Martin van Bruinessen û Robert Olson dide.<sup>11</sup> Lê dema tu guh didî Martin van Bruinessen, dibêje ku haya wî ji kurdan bi saya Beşikçi çêbûye.<sup>12</sup>

Xulase, Malbata Celîlan hem bi keda xwe ku di warê xebat û lêkolînên ser kurdan, hem bi berhevkirina folklorê kurdan û hem jî bi avakirina kitêbxane û enstîtuyê wekî navendeke lêkolînê di warê kurdolojîyê de bi rastî cih û roleke bêhempa digirin. Helbet bandor û ehemîyeta wan bi sînorên Kafkasyayê ve bisînorkirî jî nîne ji ber ku li ku derê kurd hebin her du bira ketine pey wan; dua, nîfir, çîrok, sêxiştî û hwd. qeyd kirine. Celîlê Celîl piştî hilweşîna Sovyetê jî li kitêbxaneyên Ewropayê, destxetên kurdî berhev kirine. Ev çend salên dawîyê Celîl, folklorê ku ji şêst salî zêdetir e bi Ordîxan re berhev kirine, wekî ansîklopedî cild cild çap dike. Bi qasî ku haya min jê heye, heta niha 6 cild çap kirîye.<sup>13</sup>

### **A.Ç: Radyoya Êrîvanê û rojnameya Rya Teze du amûrên girîng in di afirînerîya kurdên Kafkasyayê de. Gelo tu dikarî hinek behsa wan û rola wan li ser civata kurdan bikî?**

**M.Y:** Ez ne ji wê nîfşê me ku bi Radyoya Êrîvanê mezin bûye. Lê min jî ji mezinan seh kir ku gelek behsa Radyoya Êrîvanê dikin. Bawer dikim bi awayekî zanistî cara yekem Îsmail Beşikçi di pirtûka xwe ya bi navê Doğu Anadolu'nun Düzeni de bal dikişîne ser Radyoya Êrîvanê û nîşan dide ku çiqas tê guhdarîkirin. Lê wekî Celîlê Celîl û Cemîla Celîl dibêjin, ji

10 Metin Yüksel, “A “Revolutionary” Kurdish Mullah from Turkey: Mehmed Emin Bozarslan and His Intellectual Evolution,” *The Muslim World* 99: 2 (2009), rr. 356-380.

11 Hale Yılmaz, *Becoming Turkish: Nationalist Reforms and Cultural Negotiations in Early Republican Turkey* (1923-1945), Syracuse University Press, Syracuse, 2013.

12 Martin van Bruinessen, *Kürdolojinin Bahçesinde: Kürdologlar ve Kürdoloji Üzerine Söyleşi ve Makaleler*, İletişim, İstanbul, 2012.

13 Bo nivîseke ku van cildan dide nasîn: Metin Yüksel, “Zargotina Kurda (Kürtlerin Folkloru): Celîl Ailesinin Devasa Kürtçe Sözlü Gelenek Derlemesi,” *Kürt Tarihi* 26 (2016), rr. 18-23.

ber nebûna danûstandinên wan bi welatên derve re, haya wan tune bûye ku Radyoya Êrîvanê çiqas hezkirî bûye. Bi qasî ku ez dizanim mixabin hîn jî xebateke zanistî li ser vê mijarê tune. Helbet hem Radyoya Êrîvanê hem jî *Rya Teze* di bin bandora îdeolojîkeke giran de bûne.

Du mînanan li ser bandora radyoyê bidim. Di 2009an de ez çend hefteyan li Bazîdê bûm û bi Seydayê Mele Evdila re min kitêbên rehmetî Xelîfe Êsiv dixwend. Min derheqê Radyoya Êrîvanê de hin pirs ji kalekî kir û got: “çî di bîra te de maye?” Got: “Bîr nakim bîr nakim/Gotina Lenîn bîr nakim” û kenîya. Wendy Hamelink xebateke doktorayê li ser dengbêjan çêkir. Di vê xebata fireh a meydani (fieldwork) de dîsa meriv dibîne ku Radyoya Êrîvanê çiqas meşhûr û hezkirî bûye.<sup>14</sup>

Di hejmarên *Rya Teze* de jî gotara (discourse) giran a îdeolojîk baş tê dîtîn. Jixwe ez bawer nakim *Rya Teze* derketibe derveyê Sovyetê jî. Min gelek belgeyên resmî yên tirk di arşivê de dîtine ku jî salên 1920an heta dora 1970yan weşanên kurdî, erebî û farisî ji Sûrîye, Mîsir, Iraq û Îranê li Tirkîyeyê hatine qedexekirin lêbelê min qet belgeyek nedîtîye ku *Rya Teze* yan pirtûkeke kurdî ji Sovyetê qedexe kiribe.

Ez wisa bawer dikim ku afirînerîyeke azad nebûye, timî di bin bandora gotara (discourse) îdeolojîk a Sovyetê de bûye.<sup>15</sup> Yanî dema em li Radyoya Êrîvanê mêze dikin, divê behsa —bi gotina lêkolînerêkî ku navê wî/wê niha nayê bîra min— “cenga radyoyan” di dema Cenga Sar de timî di bîra me de be.<sup>16</sup> Dewleta tirk jî ji Radyoya Êrîvanê haydar bûye û hewl daye pêşî lê bigire. Ev yek bi awayekî zelal, di raporeke ji sala 1961an de baş tê dîtîn.<sup>17</sup> Haya min ji xebateke akademîk tune ku li ser *Rya Teze* hatibe çêkirin. Pir pêdivîya me pê heye ku xebateke kûr û dûr hem li ser Radyoya Êrîvanê hem jî li ser *Rya Teze* bê kirinê.

Wekî tu dibînî, ez dema li van mijaran mêze dikim, timî balê dik-îşînim ser pêwenda dîrokî û sîyasî; jî ber ku carinan mijarên tîn romantîzekirin. Nivîsên rehmetî Mehmed Uzun hinek bi vî rengî ne. Lê wextê ku hinek ji nêzîk ve lê dinêrî, dibînî ku di van her du meydanan de kurd, kurdî û kurdîtî wekî mijarên eslî dernakevin pêş, zêdetir amûreke cuda ye jî bo propagandaya îdeolojîk. Helbet mebesta min piçûkkirin

14 Wendelmoet Hamelink, *The Sung Home: Narrative, Morality, and the Kurdish Nation*, Brill, London and Boston, 2016.

15 Hin kilamên Radyoyê bi pêşgotineke kêrhatî hate çap kirin: Cemîla Celîl û Naza Celîl (ed.) *Stran û Awazên Kurdî 4: “Yêrêvan Xeberdide”*, Institut für Kurdologie, Wien, 2012.

16 Wekî mînak, “Radio Liberty” ya Amerîka, jî bo dinyaya bin bandora Sovyetan de weşanan dikir: İlker Aytürk, “The Flagship Institution of Cold War Turcology: Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, 1961-1980,” *European Journal of Turkish Studies* [Online], 24 (2017) URL: <http://ejts.revues.org/5517> (tarîxa dîtînê: 14 Çile 2018).

17 Can Dündar û Rıdvan Akar, *Ecevit ve Gizli Arşivi*, İmge, Ankara, 2008, r. 100.



yan bêqîmetkirin nîne! Çi û çawa dibe bila bibe, Încîla bi kurdî, wergera çarînên Xeyam, Qur'ana bir kurdî, Qewlên Êzidiyan an propagandaya îdeolojîk a Sovyetê; hemû perçeyek ji dîroka zimanê kurdî ne û hemû nîşan didin ku zimanê kurdî ji bo bawerî û edebîyata klasîk jî sîyaset û îdeolojîyên îroyîn jî hatiye bikaranîn. Lê ji ber ku li Tirkîyê kurdî hatiye piçûkkirin û qedexekirin, em dibe ku pêşketinên kurdên Sovyetê hinek romantîze bikin. Lê deynê me wekî lêkolîner ew e ku em ne romantîze bikin ne jî piçûk bikin; em di çarçova dîrokî de li gor şert û mercên wê demê û helbet li ser esasê çavkanîyên destê yekem, wan tehlîl bikin.

**A.Ç: Bi ya min, di xebatên te yên derdora kurdên Kafkasyayê de tiştê herî baldar ev e ku tu bi şeweyeke nû ya dîroknûsiya kurdan re, domînasyona ku li derdora malbata Bedirxaniyan ava bûye, pûç dikî. Bi saya vê şeweyê jî tu qadeka girîng tevli dîroknûsiyê dikî. Gelo ev şeweyê dikare rêyeke nû li ber me veke di derdora dîroknasiya kurdan de?**

**M.Y:** Helbesteke Bertolt Brecht heye, ez zaf jê hez dikim. Sernavê helbestê “Pirsên Karkerekî Xwenda” ye. Texmîn dikim dehsalên 1940an an 1950yan nivîsiye. Hê berî ku dîroka civatî ya dîroknasên îngilîz salên 1960î û *Subaltern Studies* a Hindistanê salên 1980yî hebin, Brecht bi îlhameke şairane ev helbest nivîsiye. Weha dest pê dike: “Kê ava kir Teba heftderî?/Pirtûk tenê navên şahan dinivîsin.” Dibêje Iskender dema Hindistan girt, bi tena serê xwe bû? Pirseke din jî ev e: “Êvara ku Sûra Çînê tamam bû, hosta çûne kê derê?” Di vê helbestê de, tev li ser hev 14 pirs hene. Brecht bi van pirsên ku şexsiyet û şaristaniyên mezin û navdar ên seranserê cîhanê radixe ber çavan, derseke dîrok û dîroknivîsê bi awayekî pir balkêş dide xwendevanan. Dîrok divê tenê li “mezinan” mêze neke ji ber ku tevlênebûna kesên “piçûk” çerxa dîrokê nagere. Dîroknas Sebastian Conrad jî mîna keke xweş dide: dema spîkerêkî maçê, tenê kirinên alîyekî qise bike û qet behsa tîma reqîb, hewa, temaşevan û meydana maçê neke, qisekirina maçê nîvçe dimîne.<sup>18</sup>

Çi Bedirxanî bin çi Cemîlpaşazade bin çi ‘arîstokrasîya şêxên Norşînê’ bin (wekî ku Müfid Yüksel di kitêba xwe de qal dike ya di sala 1993an de çap bûye) di nav kurdan de jî hem di warê zanistî de hem di warê popûler de, elîtîzm û parastina serdestan tê dîtîn. Ez bêtir li ser şopa belengaz, kole û bindestan im. Ev jî helbet tercîheke şexsî ye. Îro eleqeya min bi edebîyata Afrîqî re, bi Eduardo Galeano re, bi xwendîna Dipesh Chakrabarty re ji bo xatirê vê yekê ye ku ez jî elîtîzma ku di nav kurd û tirkên de pir li rewacê ye, aciz im. Bala min li ser merivên sade, belengaz û bindest e. Ez hewl didim teqîba xetên kurdî bikim yê ku tev li tevgerên bindestên cîhana sêyem bûne. Loma min gotarek li

18 Sebastian Conrad, *What is Global History?*, Princeton University Press, Princeton, 2016.

ser helbestên Goran û Cegerxwîn nivîsî ku ji bo Paul Robeson hatine nivîsandin.<sup>19</sup>

Dema em li dahatûyê dinêrin, divê em bi fantezî, daxwaz, hêvî nenêrin. Jixwe dîroka kurdan têra xwe hatîye lewitandin, îcar niha divê êdî dor dora lêkolînerên kurd be! Wextê min derheqê dengbêjan de kar dikir, min ji bavê xwe yê rehmetî seh kir ku dema piçûk bûye, di dawetan de kilamek digotin û govend digirtin. Kilam weha bûye: “Kemal bavê me ye/Şewqe li serê me ye/Kemal çû rehmetê/Xort ketin zehmetê.” Min demildest ev kilam di nav teza xwe de nivîsî! Min folklorê kurdî romantîze bikira û cih nedayê, ev yek rast dibû?

Cegerxwîn di hevpeyvînekê de qala dijîbûna wan wekî qada jêrîn dike ku gotine ne Bedirxanî, ne Cemîlpaşazade! Yanî di dîroka tevgera sîyasî ya kurd de rexneyên “qadên jêrîn” peyda dibin. Wekî Kamal Soleimani di gotarekê de qal dike, Simko jî rojnameyeke kurdî çap dike.<sup>20</sup> Yanî tenê *Hawar* nebûye. Mesele meseleya Cemîlpaşazade, Bedirxanî, Şikakî nîne; mesele ew e ku civata kurd bi axaftina kurdî, bi kilamên xwe, bi tevgerên xwe û hwd. di jîyana xwe ya rojane de jî ber xwe daye. Bawerîya min ew e ku *Subaltern Studies*, dîroka civatî û dîroka-cihan wekî metodekê li pêş me gelek derîyan vedike ku em dîroka kurdan bi awayekî analîtîk û rexneyî ango bêmezinkirin û bêpiçûkkirin şîrove bikin. Di hin xebatan de mesela em dibînin ku tê gotin ji sala 1938an heta 1959an di nav kurdên Tirkîyeyê de bêdengîyeke sîyasî hebûye. Bi min ev dîtîna elîtîst e. Di civat û ferhengeke ku xwedîyê “dengbêjan” e, ma bêdengî qet dibe! Rehmetî Reso, Şakiro, Huseyno û hemû dengbêjên din kilam, çîrok negotîne? Deng tenê dengê koma “49an” e? Divê em failîya gundîyan, jinan, dengbêjan, zarokan têxin hesabê. Di *Ronahîyê* de Celadet qal dike ku ew kitêbên piçûk ên gramerê li ser pirsên keça xwe ya Sînemxanê —ku wê demê hîn jî zarok bûye— nivîsiye. Yanî tenê mêr, xwende, bajarî, mezin fail û nivîskarên dîroka kurd nînin. Ji salên 1970yî vir de, êdî tebîet, heywan, nexweşî jî wekî aktorên dîrokê tên vekolandin.<sup>21</sup> Yanî dîrok êdî bi awayekî antroposentrîk nabe bê vekolandin, ji ber ku di jîyana civatî û sîyasî de hemû tişt ne di bin kontrola însanan de ye. Loma herçend mefhûmên wekî “qadên serdest û

19 Metin Yüksel, “Solidarity without Borders: the Poetic Tributes to Paul Robeson of Goran and Cegerxwîn,” *Journal of Postcolonial Writing* 51: 5 (2015), rr. 556-573.

20 Kamal Soleimani, “The Kurdish image in statist historiography: the case of Simko,” *Middle Eastern Studies* 53:6 (2017), rr. 949-965.

21 Sê kitêbên bêhempa li ser vê mijarê ev in: Alfred W. Crosby, *Ecological Imperialism: the Biological Expansion of Europe 900-1900*, Cambridge University Press, Cambridge, 2009; Mike Davis, *Late Victorian Holocausts: El Niño Famines and the Making of the Third World*, Verso, London and New York, 2001; Richard W. Bulliet, *Hunters, Herders and Hamburgers: the Past and Future of Human-Animal Relationships*, Columbia University Press, New York, 2005.

bindest”, “axa, şêx û gundî, karker, rênçber” ji bo analîzên dîrokî pir girîng bin jî, kêm dimînin ji ber ku însan wekî tekane navenda analîza xwe digire.

### **A.Ç: Polîtîkayên Sovyetê di derbarê kurdên Kafkasyayê de çi bûn û van polîtîkayan çi derfet an astengî bi xwe re anîn?**

**M.Y:** Dema em li pey vê pirsê diçin, divê em haydar bibin ku polîtîkayên Sovyetê taybetî ji bo kurdan nebûye. Ji ber ku ez rûsî nîzanim, çavkanîyên rûsî de çi derdikeve pêş, nîzanim. Lêbelê xebatên ku lêkolîneran bi zimanê îngilîzî çêkirine, wisa nîşan dide ku ji 1920an vir ve, mijara fireh a ku kurd jî cihê xwe tê de digirin *sîyaseta neteweyên piçûk* (small nationalities policy) û *plansazîya zimên* (language planning) e. Bo nimûne, kitêbeke ku min jê pir istifade kir *Language Planning in the Soviet Union* bû.<sup>22</sup>

Ez bawer dikim derfeta herî mezin ew bû ku salên 1930yî şûn de kurmançî bû zimanê weşangerî û perwerdeyê. Xêncî rûsî, ermenî û gurcî ku xwedîyê alfabayên serbixwe yên xwemalî bûn, wekî hemû zimanên Sovyetê, ji bo kurdî jî tîpên latînî hat bikaranîn. Lê ji Şerê Cîhanê yê Duyem û pê ve alfabe kirilî pêde pêde dewsa ya latînî girt. Xebatên Bernard Comrie, Abraham Kreusler û Michael Kirkwood di warê zimanên li Sovyetê de kêrhatî ne.<sup>23</sup> Kreusler dibêje ku bi qebûlbûna tîpên kirilî wekî alfabe ji bo zimanên xêncî ermenî û gurcî, li Sovyetê mebest ew bû ku hemû zimanan bi rûsî ve girê bidin. Gotareke di kitêba Kirkwood de dibêje ku ji 1953yan û pê de li Sovyetê 16 ziman hêdî hêdî dimirin.<sup>24</sup> Pêjna min ew e ku eger kirilî nebûya, em ê ji weşanên kurdî yên Sovyetê baştir haydar bûna lê niha sînore tîpan jî ketiye nava kurdan. Xulase perwerde, weşan û lêkolînen ku hatine kirin teqez derfeteke mezin e, lêbelê ew derfet jî bi îdeolojîyê ve bi awayekî xurt girêdayî û bisînorkirî bûye.

### **A.Ç: Bi taybetî di romanên Ahmedê Hepo de, rexneyeke tûj li ser Sovyetê tê kirin. Bi taybetî li ser sirgûnkirina duyem a kurdan a ber bi Asyaya Navîn ve. Ahmedê Hepo vê sirgûnkirinê weke trajedî û bêxwedîtîya kurdan dibîne û di romanên xwe de rexneyên giran li sîstemê dike. Ji hêla nasnameyî ve gava em bifikirin, gelo kurdan xwe aîdê wê civat û îdeolojîyê diditin an xwe weke mêvan an sirgûnî diditin?**

22 Michael Kirkwood (ed.) *Language Planning in the Soviet Union*, St. Martin's Press, New York, 1990.

23 Metin Yüksel, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: the Survival and Revival of the Kurdish-Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960*, University of Chicago, Unpublished PhD Dissertation, Chicago, 2011, r. 303.

24 Isabelle T. Kreindler, “Soviet Language Planning since 1953,” *Language Planning in the Soviet Union*, Michael Kirkwood (ed.), St. Martin's Press, New York, 1990, r. 49.

**M.Y:** Eger em guh bidin helbestên Cegerxwîn, em ê bibînîn ku ji Stalin pir hez kirîye! Sê helbestên Cegerxwîn li ser Stalin hene. Pirs weha bê pirsîn, belkî çêtir be: Kîjan kurd, kengî û çira xwe aîdî wê îdeolojîyê didît? Ez bawer dikim ku Cegerxwîn ji ber kurdperwerîya xwe ji bo Stalin helbest nivîsîne. Lêbelê kurd jî axirê civateke homojen nîne: gundîyên gundên dora Êrîvanê ji kurdên bajarî yên li Êrîvanê cuda ne. Yanî meseleya fêrîyê çîna civatî (social class) û cinsî (gender) di nav kurdan de jî bûye û hîn jî heye. Ji bo analîza nêrîna kurdên Sovyetê li sîstemê, pêdivîya me li ser lêkolînên dîrokî heye. Lê herweha divê em pir baldar bin di warê guherîna kurd, dewran û sîstema navneteweyî de. Min romanên ku te qal kir nexwendîye lêbelê gelo kengî, li ku û di çî şertan de hatine nivîsîn? Axirî nivîskar jî însan e û netîceya dema xwe ye. Nivîskar gelo 40-50 sal berê binivîsîya wê çawa binivîsîya? Mehmed Emin Bozarslan di kitêba xwe ya *Hilafet ve Ümmetçilik Sorunu* de ku di sala 1969an de çap bûye, tew navê Şêx Seîd jî zikr nake, lê piştî koçê Swêdê kirîye di nivîsên xwe de ji bo sala Serhildana Şêx Seîd dibêje “Sala Şewatê”! Di bîranînên xwe de Gıyasettin Emre dibêje ku hin kurd ji Abdülhamid re dibêjin “bavê kurdan”. Ez dût neçim, ez di xebatên xwe de jî dibînim: Di gotara ku sala 2006an de çap kir, min çawa qala jinên kurd kirîye û di ya 2016an de, çawa qal dikim. Meriv tiştên nû hîn dibe, bi dîtînen rexneyî dibe nas û dîtînen, analîza meriv jî diguherîne. Ev guhestin tişteki normal e û divê dema meriv li dîrokê dinêre bi awayekî determînîst û hişk lê nenêre; ji van tevlihevîyan (*complexities*) agahdar be. Bi vî awayî meriv lê binêre, wê bibîne ku nêrîna Sovyetê wê teqez biguhere li gor demê, pozîsyona cinsî, çîna civatî, îdeolojîk û hwd. a her kurdî. Eger hatibe sirgûnkirin, wê bêje “bêxwedîtîya kurdan”, eger di partîyê de xwedîyê pozîsyoneke baş be, wê bêje “Lenîn/Stalîn/Kruşçev bavê kurdan e” û hwd. Dîsa meseleya “têkilî”yê li vir derdikeve pêş: Ne kurd bi tena serê xwe van navan li van kesayetîyan dikin, ne jî desthilatdar ji wê derfetê dimîne ku dikeve dest. Ez bawer dikim hemû dîtînen jî dîsa bi awayekî yekalî û sade nabe ku bê şîrovekîrin.

Lê ji bo bersiva pirsê ku “kurdên dewra Sovyetê çawa li îdeolojîyê nêrîne” pêdivîya me bi lêkolîneran heye yên ku ji çavkanîyên rûsî baş haydar in. Ez dizanim ku lêkolînera ciwan Khanna Omerkhali li ser kurdên Sovyetê xebatan dike. Lêbelê bawer dikim xebatên wê jî bêtir li ser metnan e. Gerek e meriv lêkolîne di nav kurdên salmezînan de bike da ku bibîne çawa dîtîne. Divê em ji “nasyonalîzma metodolojîk” dût, bi awayekî analîtîk, li pey bersiva vê pirsê biçin. Tenê kurd nebûn ku li Sovyetê sirgûn bûn, ezîyet dîtînen. Li Sovyetê bi sedan “miletên piçûk” hebûn. Dema tecribeya wê derê bi “tirkên çîyayî” ya dewleta tirk an jî “kembera ereb” a dewleta Baas li Sûrîyeyê bidin ber hev, helbet tecribeyên cuda ne. Lê wan jî bi tecribeyên milletên derdora wan re bidin ber hev, ne bi kurdên li deverên din.

**A.Ç: Pêdivî bi xebatên çawa heye di derheqê kurdên Kafkasyayê de? Û çi derfet hene ji bo xebatên li ser kurdên Kafkasyayê? Meriv dikare bi çi rêbazan li ser mijarê bixebite?**

**M.Y:** Kurdolojî ji destpêka xwe di sedsala 19an heta îro ji hesabên emperyal cuda nebûye. Dema em îro behsa kurdolojîyê dikin, em wê bi awayekî giştî di nav “Area Studies”ê de, bi taybetî jî di nav “Middle Eastern Studies”ê de bicih dikin. Ev jî dema piştî Şerê Cîhanê yê Duyem li Amerîkayê hatiye dinyayê. Em çî wekî “Xebatên Kurdî” çî “kurdên Kafkasyayê” an “Rojhilata Navîn” binav bikin, divê em bizanibin ku ev cure binavkirin netîceyên operasyonên dîrokî, sîyasî û dîskûrsîv (*discursive*) in. Ez bawer dikim ku haydarbûneke rexneyî wê analîza me kor neke.<sup>25</sup>

Noqteya duyem jî ev e: Bêyî zanîna ziman, ez bawer nakim ku tu xebateke ser kurdan, xebateke xurt be. Dema ez dibêjim “zanîna ziman”, mebesta min zanîna gramer yan du sê peyvan nîne. Mebesta min zanîneke baş ya çavkanîyan e di wî zimanî de; hem çavkanîyên destê yekem hem jî yên destê duyem. Ziman jî ne tenê kurdî! Zimanên ewropî jî zimanên cînarên kurdan jî. Mixabin em kurmancîaxêv bi gelemperî zazakî û soranî nizanin. Metoda lêkolîna akademîk jî şertekî nebenabe ye. Çawa ku tirkek hema ku bi tirkî bikaribe biaxive, nabe pisporê aşiqan; kurdek jî tenê bi kurdîya gundê xwe ve nikare bibe pisporê dengbêjan. Lêkolîn, rêbaz (*method*) û zanebûna ziman nebe nabe. Ez wisa bawer im ev her sê jî li zanîngehên li Ewropa, Amerîka û Rûsyayê peyda dibin ku xwedîyê tradîsyona xurt a dîrokî ne.

---

25 Ev gotinên min ilhamê hinek ji gotara balkêş a ku Arif Dirlik digire ku derheqê “Xebatên Asya-Pasîfîk” de nivîsîye: Arif Dirlik, “Asia Pacific Studies in an Age of Global Modernity,” *Inter-Asia Cultural Studies* 6: 2 (2005), rr. 158-170.